Rewşa Kurdistanê

Warihêl sergelî
Kolîja perwerdê/ zankoya Duhok

Dar gwîz:
Ez dareka berdarim
Ciwan û şeng û bi sîberim
Xwarina min pirr mifaye
Yarîka zarokaye
Xoş darim bo hêlînka
Bo sivore û darikuka

Spîndar:
Bejna min rind û bilinde
Xemla nav bax û gunde
Bo bilibla hêlînim
Bo mêwa kepir û stwînim
Raste xiriş û bê berim
Lê bo nav mala ferim

Sivore:
Ruh sivkim, xwîn germ
Linav daristana digerrim
Diçime ser darên mezin
Xwarina min berrwî û gwîzin
Li gund û şara navdarim
Govara zarokanim

Bilbil:
Rengawreng û pirr nexşim
Bo hemî dila rewşim
Dengê min musîqaye
Awaza stiranaye
Car li deştê, car zozana
Car difirrme daristana

Hemî pêk ve:
Hemî çwîçik û gîyanewer
Dar û gîya û av û ber
Em mifayne, em xemlîn
Bo vî welatê şirîn
Dê bêjîn ji dil û can
.Bijî bijî Kurdistan